



Vîrosa Korona (COVID-19) agahdarî û xwendegeh – agahdarî bo bav-û- dayan û xwendekaran

Hemî hukûmetên australî – ya federal û yên wîlayetan û herêman – perwerdeyê grîng dibînin û xwe berpîrs dibînin ku piştgiriyê li perwedeya xwendekaran bikin di dema nexweşiya COVID-19 de.

Berpîrsiyariya birêvebirina xwendegehên û girtina biryaran li her wîlayetê û herêmê ya hukûmeta wê wîlayetê/herêmê û berpîrsên beşê ne-hukûmetî ye. Bo agahiyên derheqê ka xwendegeh li herêma te di dema COVID-19 de çi dikine, berê (pêşekî) peywendiyê bi xwendegeha xwe re deyne, û bi şîretên (pêşniyaziyên) hukûmeta herêma xwe bike. Lînkên malperên perwerdeyê yên hukûmetên wîlayetan û herêman li jêr in:

[Australian Capital Territory](#)
[New South Wales](#)
[Northern Territory](#)
[Queensland](#)
[South Australia](#)
[Tasmania](#)
[Victoria](#)
[Western Australia](#)

Hukûmetên wîlayetan û herêman pejirandin (qebûl kirin) biryarên di dema COVID-19 de derheqê xwendegahn de bihên girtinê dê lîgor şîretên aliyên pîspor, fermî, neteweyî û wîlayetî yên tenduristî û perwerdeyî bin.

Kêmkirina îmkana tehlûkeya ji-hevpêketina COVID-19 li xwendegehên

Roja **24ê nîsanê 2020**, Komîteya Australî ya Parastina Tenduristî, *Australian Health Protection Principal Committee* (AHPPC), şîretên tenduristî [health advice](#) ragîhandin, derheqê kêmkirina îmkana tehlûkeya ji-hevpêketina nexweşiya COVID-19 li xwendegehên. Ev rêberî û şîretên hêsan bo berpîrsên xwendegehên hatine amadekirin, ku bi zarokan, bav-û-dayan, mamosteyan û karkerên alîkatiyê re peywendîgir in. Armanca amadekirina wan ew e ku tehlûkeya radenizm ya îmkana ji-hevpêketina nexweşiya vîrosa korona (COVID-19) li xwendegehên di dema vê vîrosê de hîn jî kêmtir bike.

Bi kurtî hinek ji kiryarên mirov bide pêş çavan ev in:

- **Bo bav-û-dayan:** ger zarok nexweş be, divêt neçe xwendegehê. Divêt li mal bimîne û ji yên din dûr be. Dema bav-û-day diçin xwendegehê, yan zarokan dibin wir, yan ji wir radikin, divêt hevdûriya ji bav-û-dayên din û ji mamosteyan ji bîr nekin.

- **Bo zarokan:** diya xwe, bavê xwe, serpereştên xwe û mamosteyê/mamosteya xwe agahdar bike ger xwe nexweş hest bikî.
- **Bo mamosteyan:** Neçe kar ger nexweş bî yan xwe wek kesekî rewşa xwe ne baş e hest bikî.
- **Bo hemî mezinan:** tehûkeya herî mezin ya ji-hevpêketina nexweşiyê li xwendegehên di navbera mezinan de ye. Gellekî grîng e ku hem mamoste û hem bav-û-day derheqê ji-hevdûriyê de miqayit bin, di navbera hev de û di navbera xwe û yê din de li xwendegehê.

Pakî

Xwendekar divêt haydar bin ku:

- Destên xwe pîrr-carî bi sabûnê û avê bişon, her weha li pêş û paş xwarinê û li dû çûna tuwalêtê.
- Matiryalê temîziyê yê bi navê “*sanitiser*” bi kar wînin.
- Kuxîn û bonijandina xwe bi enîşka xwe yan bi destmala kaxizî (*tissue*) biniximin (ne bi destên xwe).
- Destmalên kaxizî (*tissues*) li dû bikarhanînê di cîh de têxin sepeta gemarê û dû re destên xwe bişon.
- Hewl bidin destên xwe bi dev û rûyê xwe nekin.
- Destê kesekî/kesekê negirin û dest nedin kesan.
- Hewl bidin ji rewşa adetî bêtir navberiyê di navbera xwe û yê de bihêlin.
- Ji têketina dorê dûr bimînin.
- Alîkariya yê din bixwazin ger xwe xemxwar hest bikin.

Tevdêrên derheqê vegera şagirtên pola 12emîn li xwendegehên navend û xwendekarên zanîngehan.

Di 7ê nîsana sal 2020 de wezîrên perwerdeyê li wîlayetan û herêman pejirandin ku xwendekarên pola 12emîn dê bikaribin dawîya salê belge-nameya qedandina xwendina navend (shehadeya lîsê, bekalorya) bi dest xin, û ev belge-nameya (şehadeya) dê rêya zanîngehê, xwendina bilind û karkirinê li pêş wan veke.

NAPLAN

Di 20ê adara sal 2020 de wezîrên perwerdeyê biryar girtin ku NAPLAN dê sal 2020 cîh negire. Cîhgirtina NAPLAN bo rojên 12 ta 22/05/2020 hatibû plankirin.

Biryara ku NAPLAN sal 2020 cîh negire hat girtin bo alîkirina berpîrsên xwendegehên, mamosteyan û alîkaran ku bala xwe bidin çakrewşiya (xoşhaliya) xwendekaran û domandina perwerdeyê.

NAPLAN planeke neteweyî ye ku taqeta xwendekaran di sê mijarên perwerdeyê de dixê îmtîhanê-xwendinê, nivîsandinê û rêzimanîyê, û hesabdariyê. Xwendegehên hemî wîlayetan û herêman ji sal 2008 û vir ve serpereştîya NAPLAN dikrin.